Newroz

Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ

Hejmar (97) sal 16 Nîsan 2011 z - 2623 k Buha (15)ps

Li Sûriyê çi dibe ?

Weke tê dizanîn , rijîma ku li Sûriyê serdest û desthilatdar ,rijîma tek-partiyê ye , rijîma parta Be'is e û hew ! tevî ku – xwedê giravî –çend partiyên dî jî mîna (P.yekîtî ya Ereb a sosiyalîst , du partiyên komonîst , yekîtiya sosiyalîstên Ereb …) hene . Lê , xwe di siha û çarçewa siyaset û helwestên parta serdest a Be'is de dibînin , û çênabe serbixwe bin . Kêm – zêde , mirov dikare bêje , weke ew çend partiyên li welatên rojhilatî Ewropa , di dema rista sosyalîst de ku di siha partiyên komonîst de xwedî nav bûn (mînaka Bulgariya Cîfkof , Almaniya rojhilat a Honîkir , Romaniya Çawçîsko …).

Civaka Sûrî ji sala 1963 an de , ketiye bela vê reng rijîma tek partiyê , rijîma (parta Be'is a erebî ya sosyalîst) , û ji bîr nebe ku desthilatiya vê partiyê ji hîngê ve , ne bi helbijartinan bû , ew bi rastî , bi darê zorê , bi hêza leşkerî bû .

Ji hîngê ve , ango eve 48 sal in , li Sûriyê helbijartineke mîna helbijartinên xelkê çê ne bûne , ne yên perlemnto û belediyan , nejî yên sendîqan …H.W.D .

Û li dirêjahiya vê demê , helbijartinên ku dibûn, tim û tim li gor bejin , sîstem û sînorên parta Be'is û diruşmên wê bûn . Lewre jî , di çavên piraniya xelkê Sûriyê de – çi Kurd û çi Ereb - pêkenîk û sexetekarî bû .

Jixwe , nebûna qanûnekê bona lisazxistin , D.R (11)

Isma'l Omer — **4**
Diyar Ehmed

Gelên Ereb û Rizgariya siyasî — **6**
Rozad Elî

Danasîn bi romana — **8**
Rêberê Silîvî

Rêzgirtina Mafên Mirovan — **10**
Enehîte Murad

Email : Newroz 95 @ hotmail . com

www.partiyekurdi.org

Nûçe û Çalakî

Bi xêr hatin!!

عمر اسماعيل عبدالصمد محمود

Demjimêr 11ê sibeha roja yekşembê 17ê nîsana 2011an, hersê rewşenbîrên Kurd Ebdusemed Hesen Mehmûd(helbestvan), Umer Ebdê Ismaîl(helbestvan), Ahmed Fetah Ismaîl(rewşenbîr û xwediyê malê), piştî borandina 4 mehan di zindanê de, azad hatin berdan.

Bi gul, çîçek û beşdariya gelek rewşenbîr, welatparêz, nûnerên hin partiyên Kurd, rêxistinên mafên mirov û parêzer Kurd, girtiyên çand û peyva kurdî li bajarê Qamişlo hatin pêşwazîkirin.

Bi navê komîta NEWROZê, em xêrhatina helbestvan û rewşenbîrên xwe yên xoşewist dikin û baweriya me ew e ku, paşeroj ne ji nijadperstî û quretiya milî re ye, lê belê, ew ji azadî, aştî, mafên mirov û gelan re ye.

Mam Xenî Bilûriyan Çav damrandin

Elmanya: Xenî Bilûriyan ku wek (Mam Xenî) tê naskirin duh 09.03.2011ê li mala xwe ya bajarê Koln ê Elmanya koça dawî kir. Mam Xenî yek ji kevneçalakvanên siyasî yê Rojhilatî Kurdistanê bû û di temenê 86 salî de koça dawî kir.

Bilûriyan, ji ber çalakiyên dijî hikûmeta Îranê bi gîştî 25 salan di zindanê de maye û demeke dirêj e li derveyî Îranê jiyana xwe derbas dike. Bilûriyan sala 1924ê li bajarê Mehabad ji dayik bûye û di 18 saliya xwe de dest bi karê siyasî kiriye. Yek ji damezrênerê (Rêxirawê Lawên Kurd) bû, piştre bûye endamê yekemîn kongreya Partiya Demokrat a Kurdistan-Îranê. Mam Xenî, piştî darbeya 1953ê li Tewrêz bi cîh dibe û ji rojnameya organa Partiya Demokrat a Kurdistan-Îranê re dixebite, lê piştre li Sine tê girtin û 3 salan li Tewrêz tê zîndankirin.

Dema hat berdan hevsera wî (Merziye Sedîq) bi du keçan dûcanî bû, dubare hat girtin û emrê îdamê jê re derket. Lê, li ser daxwaza hinek kesayetiyên cîhanî yên naskirî wek; General Dugel, Andre Maldro, Ehmed Sukarno û Cemal Ebdulnasir hikmê wî hat hilweşandin û bû heta hetayê.

Mam Xenî sala 1978ê di dema Şoreşa Îslamî ya Îranê de, ji zîndanê rizgar bû. Bilûriyan ku demeke dirêj a temenê xwe li Elmanya derbas kiriye, di sala 1997an de kitêba bîreweriyên xwe bi kurdî li Swêd çap û belav kiriye.

bi navê komîta rêvebir ya weşana Newrozê, bila serê xwedî,dost û gelê Kurd sax be.

Ji malpera Newroz

Xebatkar C. Namiq jiyana xwe ji dest da

Di. 21 ê Avdarê siyasetmedar û têkoşerê bi nav û deng Cewher Namiq Selîm - Kurdistana Îraqê- li Stokholmê çavên xwe damraindin .C.N ji endamên Kevin, zîrek û zana yê PDK Îraqê bû. Di helbijartina 1992 an ya Kurdistanê de, dibe endam û Yekemîn serokê perlemanê û ta sala 1999 an berdawam dike. Piştre dev ji PDKê berdide û rexneyên xwe li rijîma siyasî û Îadara Kurdstanê dike.Û berê xwe dide dûriyê, li Siwêdê bi cîwar dibe .Roja 24ê, termê pakrewanê hêja digihe Kurdistanê û ji hêla Serok M. Berezanî, B. Salih , K. Kerkokî, Perlemantêr, dost,hogir û xwediyan tê pêşwazîkirin û li gundê wî – Berlotî –Nahiya Kelar- tê veşartin

bi navê komîta rêvebir ya weşana Newrozê, bila serê xwedî,dost û gelê Kurd sax be.

www.arsivakurd.org

Nameya Newroz ê

Hersal bi hatina roja 21-ê heyva Avdarê re , gelê Kurd serûber , cejna xwe ya netewî, Newrozê bi bîr tîne, biçûk û mezin, jin û mêr, zarok û navsal bi dil û can dixwazin pê şa bibin. Vêca li gor merc û hoyên jihev cuda, taybetmendiya her welatek û herêmekê, şêwe û durişmên cur be cur û pir reng têne hildan û bikaranîn , Lê, naverok yek e , hestên dilgermiyê û hişyarbûna netewî ye, dengvedana doza Azadî, Aştî û Wekheviyê ye, doza mirovhezî, şahî û xweşiyê ye.

Li vê dawiyê, li ser daxwaza hinde endamên komela neteweyên yekbûyî, rêxistina Yoniskoyê-UNSCO- erê kiribû û biryara xwe dabû ku, Newroz weke cejneke cîhanî bête Pejirandin û nasîn, lê mixewbin, bê ku gelê Kurd bi nav bibe .

Li Sûriyê , li dirêjahiya bêtirî 50 salî, xebatkarên Kurd ên demokrat, bi roniya çavan , bi cerg û hinavan, Newroza gelê xwe parastine û her dê biparêzin, ji ber ku ev Neroza me , ne tenê cejneke salane ye û hew,lê belê, şana rûmetê, hebûn, vejîn û jîndariya gelê Kurd e, lewre jî, cejna Kurdan ya herî biha û Pîroz e.

Di dema îro de, ji bilî pêxistina agiran li serê çiyan, li seranserî herêmên Kurd li Sûriyê,Kurdax, Kobanî û Cezîrê, digel bajarên navdar mîna Heleb, Şam, Hesekê, Reqê û Latakiyê jî , Newroz şên dibe, û bi deh hezaran hemwelatî,çi Kurd, Ereb,Siryan, Kildo-Asor, Çerkez, Ermen û Turkmen , File û Misilman têne ba hev û bi lihevkirineke biratî Nerozê pîroz dikin ,rê li ber xwedî hişên teng, hişk û nijadperest, çavsoriya şovenîstan teng dibe,nemaze gava ala niştîmanî tête bilindkirin. Loma jî, rêzgirtin û parastina ev reng kombûn govendên Newrozê, erk û ustibarê hemî hêz û kesa ye,Newroz jî hemiyan hembêz dike.

Li dawî, hêjayî gotinê ye ku,ji Newroza par ta Newroza îsal 2011,sê xebatkarên newrozperest,ên di nav gel û tevgera Kurd de navdar , me wenda kirin, ew jî, serokê parta me mamoste **Îsmaîl Umer**, yek ji danerên yekemîn partiya siyasî bona Kurdên Sûriyê, mamoste **Reşîd Hemo** û Mam **Ebdil-Xenî Biloriyan** ê ku di ber gelê xwe yê Kurd de bêtirî 25 salan di girtîgeh û zîndanên Îranê de borandibû, emê bejna xwe li ber xebat û bîranîna wan û hemî camêr, xebatkar û pakrewanên tevgera azadîxwaz a Kurd bitewînin û şehîdê Newroza Şamê li sala 1986 -an **Mehmed Emîn Silêman Adê** bi bîra xwe bînin.

Bijî xebata gelê Kurd bona Aştî, Azadî û Wekheviyê.

Bijî Newroz û sersala we hemiyan pîroz .

18 .03 .2011

Komîta rêvebir ya Parta Yekîtî ya Demokrat A Kurd li Sûriyê.

www.arsivakurdi.org

Isma'il Omer
Çirahilgirê têgehên nûjen

Diyar Ehmed

Dema mirovekî Kurd yê têkoşer û xebatkar ber bi dilovaniya xwedê ve diçe, gelek gotar û nivîser li ser jîn û jiyana wî kesî têne weşandin, lê mixabin tevaya wan nivîsaran di warê jimartina qenciyan û vedana pesnan de dimînin.

Ji ber tivavekî ew alî hatiye têrkirin, pir nivîs û babet li ser hatine belavkirin.Emê hewil bidin ku hinekî xwe dûrî wî warî bikin û tenê derbas bibin di naverasta daxuyanîkirina nêrîn û ramanên wî mirovî civakêş û cangorî de. Ew kesê navdar ne li hêviya wê ma ye, ku mirov pesnê wî bide yan jî li ser wî bigirî û reşê li ser girê de, dawiyê dana pesnan, jimartina başî û qenciyan weke şabaşên mitirbane, bi betalkirina dawetê re, ew şabaşî dimînin di şûn de û li cihê dawetê diqurmiçin, û têne jibîrkirin.

Vêca Pirs ew e, eger em tenê pesnê wî kesê bîrbir, rewşenbîr, zîrek û çeleng bidin, qencî û başiyên wî diyar bikin, emê çi li jiyana wî zêde bikin…?.wek ku bav û kalên me di zargotina xwe ya şêrîn de gotine: (girî û reşgirêdana li ser miriyan weke qêrîn û hawara li dûv gura ye).Ji ber vê yekê jî em dizanin ku em nikarin xwe û xwe negrin. Emê li şûna delal û xoşewîstên xwe hêstiran bibarînin, rondika birijînin, tenûra derd û kulan sar bikin û bilorînin. Nexasim di demeka wisa tenik û hestyar de, ku meydana kar û xebatê ji xebatkar û cangoriyan re maye vala,jimara kurdperwer û berevanên kêşa kurdî di kêmê de ye,kaniya dana merd û qehremanan îro ziwa bûye. Emê bikin hawar û qêrîn,hevsarê hêstir û rondikan berdin ku di ser dêman de bi gindirin,tevî ku em dizanin wê serkaniya wan hêstir û rondikan biçike.Lê tevî wan jî tiştê giring û pêtvî ew e, ku mirov tucarî şûn û şopa wan têkoşer û xebatgêran bernede,bîr û ramanên wan ronî bike, li dû daxwaz û xwestekên wan venegere, doz û kêşa wan dayî li ser milên xwe ne deyîne, ta nîrê sedestî,sitem û zordariyê li ser sînga miletê me rabe û milet bi serbestî li ser xaka bav û kalan bi azadî û wekheviyê şabibe. Hîngê di baweriya me de wê cangorî û cefakêşên miletê me serê xwe bi nazî deyînin û bêhin fereh herin gorê.

Emê di van çend rêzan de, li ser hin çirîskên geş di quncikên tarî de vêketine, û li ber bayê peyîzê serê wan çirskan miçûbel dibin, li ber çirîskên çiraya yekî ji wan mirovên merd û cansivik rawestin,tevî ku me berî niha jî da xuyanîkirin ku pir gotar û nivîser li ser wê rewşê hatin weşandin.Lê, emê hinekî xwe berdin di nava keliş û kevanên bîr û boçûnên mamoste Isma'il Omer serokê Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê (Yekîtî) de û hin ji raman û nêrînên wî yên balkêş diyar bikin,û hin dîtir ji destxet û helwêstên wî yên mafadar bidin xuyakirin,riya wî girtî bikelêjin, wan têgehên hûr û kûr vedin û hilkewêşin û wan li ber ronahiya çirahilgirê wê vewejêrin,ji seqemê biparêzin.

Mamoste Isma'il Omer rêkelêjê peyv û gotinên nazik û ciwan bû,çirahilgirê têgehên ravekêş û nûjen bû, yek ji serkird û xebatkarên pêşeng di nav rêzên Tevgera Kurdî li rojavayê Kurdistanê de bû û cihekî wî yê taybet û xuya hebû.Çima ev cihê berz girtibû û ew baweriya mezin di civaka kurdî de pê hatibû kirin,û cihê bilind û xuya di dil û canê dost û hevalên xwe de jî çêkirbû…?

Bi rastî wek min mamoste Isma'il Omer ji nêzîk ve nasdikir, û wek ji nivîsar û ramanên wî jî tê xuyakirin, ewî ev cihê berz û bilind, baweriya kûr li rex hejêker û dostên xwe standibû, ne tenê **D.R.5**

www.arsivakurd.org

Mamoste Isma'il Omer ronakbîr û ramankêş bû,gihabû astê ku, hiriya bîr û boçûnan, vediçirî,rîsê nêrîn û ramanan dirist,tevna têkilî û helwestan dihûnand; Karî di nîr û kewdanin teng û tarî de,bi şanazî imza xwe li guhertina reng û şêwazê kar û xebata gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê bide,û gotara siyasî ya tevgerê ber bi astin bilidtir ve bibe,ku bigihê qonaxa wan nêrîn û ramanên ku, di hiş û sewdana wî de diqeliqî û lîsdigirtin.Li ber jena dilê wî yê paqij dijenî,bi êş û jana miletê Kurd ve dijiya,rêz û rêbazên çareseriyê li pêş kêşa kurdî nîşan dida,sînorê nexşek lihevhatî serastdikir,dest pê dikir û digot:Sûriya îro ne bi dest û vîna gelê Kurd û Ereban hatiye avakirin,Sûriya bi sînorê xwe yê niha ve, li ser lihevkirin û lihevhatinên hêzên nêvdewletî gorî peymana Sayîkis–Pîko hatiye damezrandin,gorî xalên wê rêkeftina nêvdewletî, dewletên hevalbend perçak ji welatê Kurdan û parçek ji welatê Ereban gihandin hev û tevlîhev kirin û nexşê Sûriya îro danîn. Ango, welatê Sûriyê ji du gelên serekîn pêktê,ku herdu gel jî di herêmên xwe yên dîrokî de dijîn.Tevlî hin miletên dî jî mîna Ermen,Aşor,Çerkes û Suryan di bin pêkhatiyên Sûriyê-tevî ku, peymana Sayîkis – Pîko bê vîna wan miletan jî gihandin hev. Lê belê, Sûriyê kir welatê tevan û li ser wan hate ferzkirin ,ku tev de di rizgarkirin,avakirin û parastina serwerî û serxwebûna wê de hevpar bin. Destnîşankirina reng û rûyê wê yê paşerojê di destên wan de be,beramberî ku, tev de di maf û erkan de wekî hev bin û li pêşberî yasyê jî bê cudayî yek bin.

Dîsan li ser bilinkirna ala Kurdistanê ji aliyê xortên Kurd ve,çi di hundir welêt de yan jî li derveyî wê, digot : Bilindkirina ala Kurdistanê merem û armanc jê ne daxwaza cudakirin Suriyê yan serxwebûna Kurdistanê ye.Lê, belê mebest jê ew e ,ku ala Kurdistanê nîşana miletê Kurd de û taybetmendiya wî jî dide naskirin. Hildana wê, di warê pênasîna bi kêşa kurdî û daxwaza mafên rewa ya gelê Kurd di çarçêwa yekîtiya welêt de tê.

Baweriya wî bi reseniya gelê Kurd û dîroka wî ya kevnar xurt û mezin bû .Herweha baweriya wî bi berxwedana gelê Kurd û girêdana wî bi kêşa wî ya dadmend ve gihayî û pija bû.Wî digot : Tucarî di dîroka gelan de ,siyasetên tepeserî û binpêkirinê,pirojeyên pişaftina netewan bi sernakeve,û hewldanên guhertina nav û nîşanên netewayetî ji çi gelî re be , têk çûne û şikestine. Ji ber ku ,navên resen yên gund û bajarên Kurdan li Sûriyê di bîra wî de bûn . Çiqasî hêza Erebkirinê û xwedanên wê xurt û mezin biba; Ewqas ew nav di kaniya dilê wî de dihatin çandin, di hiş û sewdana wî de dihate nimandin,dibûn perçak giring ji jîn û jiyana wî, û xewn û bîranînên zarokatiya wî pê ve dihatin girêdan. li cem wî parastina vî navî bûbû erkeke netewî û nîştîmanperwerî.

Bi kurtî em dikarin bêjin ,ku li ber çira raman û nêrînên wî, reng û şêwazê xebata gelê Kurd li rojavayê Kurdistanê ber bi qûnaxin bilidtir û nûtir ve diçû.Rol û kartêkirina wî ya berçav di guhertin û nûjenkirina şêwazên xebatkarî de ,û herweha derbaskirina raman û têgehên nû mîna pêvedana daxuyanî û beyanaman li sikak û celdan ,xwepêşandan û mangirtin li pêşberî dezgehên desthilatdariyê li Şamê,gurkirina çalakiyên revenda kurdî li Ewropa û deverên dî yên ji der ve,pişgiriya bizav û tevgerên rewşenbîrî û civakî,guhdan û pişevaniya rojname û govarên kurdî,girêdana kêşa kurdî li Sûriyê bi pêkhatina dîmoqrasiyê ve,giringiya xutkirina eniya berhingariya Sûriyê û damezrandina Danezana şamê,helwêstên zelal ji PKK ê û parçên dî yên Kurdistanê,reftara wî ya nêvnas bi cudakar û nakoknêrînên wî re,nûjenkirina raman û nêrînên yekirin û yekîtiya nav rêzên bask û aliyên tevgera kurdî li rojavayê Kurdistanê,yekkirina gotara siyasî û rêkûpêkirina navmala kurdî,girêdana kongirê netewî û peydakirina lêvegereka kurdî. gurzeke ji nêrîn û ramanên bûn, ku hişê mamoste Isma'il Omer pê dijenî , di kovanên dilê wî yê fereh de dihat çandin û bi cegerê wî dihat parastin.

www.arsivakurd.org

Gelên Ereb û rizgariya siyasî

Rozad Elî

Tevgerên nerazîbûnê û serhildanên gelêrî ku li piraniya dewletên Rojhilata Navîn radibin, nemaze jî li hin dewletên erebî, bi tevahî di çarçewa pêkanîna çend daxwazên sereke de digerin: ((kar, azadî û rûmeta mirov)).

Gava em li dîroka gelên Rojhilata Navîn vegerin, emê bibînin ku gelên Ereb ji sedsalan ve di bin nîrê dagîrkirinê de bûn û ji serweriya xwe ya neteweyî bêpar mabûn.

Lê, di encama herdu şerên cîhanî yê yekê û diduyê de, sînorine siyasî yên nû li Rojhilata Navîn hatin danîn, û dewletên Ereb yên ku niha hene hatin damezrandin, û ji derdora 60 salî ve jî serweriya xwe ya niştimanî, wek milet û sînor, bi dest xistin û bûn dewletine serbixwe.

Di demên damezrandina wan dewletan û bidestxistina serbixwebûnê de, civakên Ereb jî mîna piraniya civakên ku demeke dirêj di bin barê dagîrkirinê de dimînin, rewşên wan jî lişûnmayî û xizan bûn. Ango, ew jî ji pêzanîna şêweya avakirina dewletan û gerandina siyasetê dûr bûn, tenê nofekî biçûk ji dewlemendên xwende, û hin efserên serbazan ji birêvebirina siyasetê, dewletê û desthilatê re amade bûn.

Ji bilî ku, li destpêka bidestxistina serbixwabûnê, mijarên çawahî û şêweyên damezrandina dewlet û sazûmanan û birêvebirina wan jî li ba beşê herî mezin ji gel ne cihê pirsê bû. Loma, jî ji destpêka salên serbixwebûnê ve, saziyên dewletê, desthilat û rêvebirina wan, kete destê nofeke biçûk ji mirovên xwedî sermiyan, û hin serdar û efserên leşkeran. Ew nofa serdest a biçûk, destlat û dewlet li gora berjewendiyên xwe ava kirin, û sazûman û zagonên wê yên bingehîn jî li gora daxwaz û baweriyên nofa xwe, yan jî ji bo parastina destladariya partiyekê, nofek olî, yan jî hozekê danîn.

Li gora pergalên gişti yên ew sazûmanên nû, piraniya pir ji gel, ji karûbarên dewletê û çêkirin û gerandina siyaseta wê hat dûrxistin, û bi demê re mafên wî yên herî bingehîn, mîna "azadî, hilbijartinên durust, dad, jiyaneke bi rûmet,…" jî jê hatin standin, û herwiha destlatên bê azadî û ne demokratik cihê xwe girtin. Gelek caran diktetoriyet û olîgerşiya destgiran jî, ji zikê wan sazûmanan derketin, mîna sazûmana Sedam li Îraqê û H.W.D.

Bi şêweyekî tevehî em kanin bêjin, rast e ku miletên Ereb di têkoşîna rizgariya niştimanî de bi ser ketin, û sînorên xakesiyasî yên dewletên xwe danîn, û nav û al jî ji wan re çespandin. ê belê, tîkoşîna wan di çarçewa sînorên rizgariya netewî de sekinîn û derbas warê pêkanîna dewletên yaseyî û demokratik nebûn, û tu xebatên bi encam jî ji ber ve nehatin kirin.

Loma jî, bêdadiya civakî û rewşên bê demokratî û bê azadî ku bi avakirina dewletên Ereb re hatin, wek xwe man û bi demê re hîn aloztir bûn. Destlatdarên ku hatin ser postên dewletê jî, hewildanên guhertinên pêwîst û hemdemî di sazûmanên xwe de pêk nanîn. Di wan rewşan de, tovên nakokiyên civakî û qeyranên siyasî ewên ku ji destpêka damezrandina dewletan de mabûn, roj li dû rojê mezin û gur bûn, û rewşên tevahî yên civakan gihandin sînorên peqîn û serhildanan.

Li Sûryê jî, bi tevahî, rewş bi wî rengî bi rê ve çûye, û gelê Sûrî jî ji sala 1945an de, ji hemî mafên xwe yên bingehîn mehrûm bûye. Ango, li dirêjiya 66 salan û ta roj îro, pêwendiyên di navbera destlatdaran û gel de durust nebûne. **D.R .7**

www.arsivakurdi.org

Dumahîk : Gelên Ereb…

Destlat herdem ji hêla zabitekî yan ji hêla partiyeke takane ve hatiye hukumkirin, û gel jî bi hemî nof û pêkhatiyên xwe, ji dadê, wekheviyê, azadiyê û gelek mafên xwe yên rewa bêpar maye, û ji hemî karûbarên siyaseta bilind a dewletê jî hatiye dûrxistin.

Li ber roniya van rastiyan, roj bi roj nakokî di navbera gelên Ereb û destlatdarên wan de kûrtir dibe, û qeyran bi hemî rûdawên xwe rû didin. Ji ber ew pirsên giring ku ji salan ve hene û pir zengirîne, û destlat jî li ew rewşên xirab mikûr netê û înkar dikin, yan jî hewil didin ku sazûmanên xwe yên rizîyayî perpîn bikin, lê belê dîn jî dizanin ku ew derdên giran ku bi salan laşê dewletê dikolin û gel û civak jî wêran kirine, bi perspankirinê derman nabin. Û hemî kes pê bawer bûye ku çareserkirina û guhertinên rast û bingehîn, di hemî warên sazûman û destlatê de dest pê dike, û ji bilî wê tu rê tuneye.

Rûdaneke xembar a hatûçûnê!

Roja yekşembê 10ê Ninsanê, li bajarê Şamê, li ser riya Dîmas, herdu hevalên partiya me yên ciwan: Sabir Mihemed Elî Îsa(31 salî) û Tevger Xelîl(fehîm) Silêman(23 salî) di rûdaneke hatûçûnê de jiyana xwe ji dest dan.

Sabirê Îsa

Tevgerê Fehîm

Hevalê Sabir, [illegible] doktorê(beyteriyê) û bavê kurekî ye, ew jî mîna sedhizarê Kurdên Cizîrê ji ber pilana serhijmara awarte ya sala 1962an ji mafê hilgirtina nasnameya welatê xwe Sûriyê hatiye bêpar kirin, bi malbatî koçberî Şamê bûye û dest bi xebatê kiriye.

Hevalê Tevger, ciwanê 23 salî, ji ber ku navê wî yekcar di lîsteyên dewletê de tune ye, ji wê girûpa bi navê (mektûm) tênebi navkirin, ji bilî sinifa 9an pê ve ne xwendiye. Ew jî li Şamê, ji bo debara malbata xwe dixebitî.

Bi beşdariya gelek mirov, gundî, dost, heval û hogiran, termê herdu ciwanên hêja di goristana Til Merûf de hatin veşartin.

Bila serê malbat, dost, heval û hogirên wan sax be, cihê wan buhuşta rengîn be!

Sê birûskên çêrokî

(1)

Ebdilmecît Şêxo

Gundekî di nav herdu pêsîrên lêlûna dêrînî de , xwe li ser enîşkeke zamdar palveda bû, ewî mîna dapîreke qisawetxwar stêrkên ezmên yên wek zerdelên Basotê ji neviyên xwe re dijmartin û bi dengekî nermîn û hêminî ewanan dikirin xewa ne xew . Lê nobetdarekî mîna qantirê Aleman bi pekandina kevirên bin lingên xwe ,serê xewa ne xew jî şikaaaand.

(2)

Di şikefta Duderiya min de , zarokek 40 hezar sal nobetdar bû, gava pêriyên bajarê min rasterast ji wî pirsîn; ma tu, me jî nasdikî ? Hestiyên nobetdar lerizîn, keniyan, dagrîn û gotin : Çiqas Mîtaniyên we sersiyên xwe li min dikirin û ji min hezdikirin ! Lê hûn dikanin ji min re bêjin ; rewşa Nefertîtî çawa ye ?

3)

Du şivan simêlbadayî , pezên xwe li ser sîngê çiyayê Lêlunê de diçêrandin, taveke baranê bi zerp lêkir , şivanan pezên xwe bi lez ajotin nava şikefteke nîzîk, şivanekî di wir de pirtûkek çiriyayî , rizyayî ya Cegerxwîn (Kî me ez) dît. Şivanekî ji yê din pirsî ; çiye ev ? Ewî gote hevalê xwe , pir mixabin ,ez jî mîna pir siyasetmedarên me hîn bi kurdî nizanim bixûnim, lê va ye ez wêneya Cegerxwîn li ser pirtûkê dibînim û herweha jî pir baş têtebîra min , ku beriya 40 salî ,şagirtên dibistana Efrînê cejna Newrozê di vê şikeftê de bi nehînî pîroz dikirin û dilên hevdu bi hêviyên cejnên meziiiin geşşş dikirin .

Efrîn. 21.03.2011-***Ji malpera Efrîn***

www.arsivakurdi.org

Danasîn bi romana

"Serhatiyên Rustem û namerdiya namerdan"

Ya nivîskarê Kurd ê hêja:**Riza Çolpanê**

Amedekirina: Rêberê Silîvî



Riza Çolpan, Kurdekî Dêrsimî, bi rêola xwe jî (elewî) ye. Ew li sala 1936an, li gundekî ji gundên bakurê Kurdistanê, hêla Dêrsimê ji diya xwe bûye, 5 salan dibistan xwendiye û sala 1951ê, ji ber tengasiya rewşa malbata xwe ya aborî, berê xwe dide EDENê û paşê jî STENBOLê. Ew li wir dixebite û diravan ji malbata xwe ya perîşan re dişîne. Piştî sê salan leşkeriya dewleta Tirk dike, îca berê xwe dide girava QIBRISê û li wir dibe xwedî jin, zar û zêç. Sala 1962an, careke din vedigere STENBOLê û sala 1970î koçber dibe û li Aoustralyayê cîwar dibe, nasnameya wî welatî hildigire û ta vê gavê li wir dijî.

Roman ji 560 rûpelên pîvana orte pêk hatiye, ji weşanên VENGê ye. Çapa yekemîn, di Tîrmeha sala 2004an de derketiye. Ew bi zimanekî xweş î lihevhatî, hestekî nazik û zîrekiyeke wêjeyî hatiye nivîsandin. Lehengê romanê, Rustemê Kurd, jiyan û kesayetiya romanivîs bi xwe nîşan dide, herweha roman rewş, pergal û jiyana gelê Kurd li bakurê Kurdistanê ya wê qonaxê nîgar dike. Zimanzan û folklornasê Kurd Pirofêsor birêz Celîlê Celîl, bi pênûsa xwe ya zêrîn û zimanê xwe yê şêrîn pêşgotineke bedew jê re nivîsandiye.

Naveroka Romanê bi kurtasî:

Rustem, xortê Kurd ê nûhatî, ji ber rewşa malê, ji ber xizanî, sitemkariya zirdebirayê xwe ji gund direve, diya xwe ya bî û çend zarokên biçûk li şûn xwe dihêle û bi mebesta peydakirina karekî, berê xwe dide bajarê mezin STENBOLê. Rustem, li durv û jiyana xelkên wî bajarî matmayî dimîne. Cudahiyeke mezin di navbera jiyana gund û wî bajarî de dibîne, çawa ku elektrîkên rengîn bajêr dixemilînin, jinên servekirî û çaqrût bi tena serê xwe di kolanan de diçin û tên, deryaya mezin bajêr dorpêç dike, li hawîr dengê motorê keştiyên deryayê belav dibe... Li wir, gelek heval, hogir, gundî û nasên xwe dibîne, ew rebenên ku karên herî giran û gemar dikirin!!...Ji neçarî, ji bo peydakirina nanê rojê, li kêleka wan dost û hevalan, Rustem jî dest bi karê barkêşiyê dike, li cihê serjêkirina dewaran, di nav rêx û pîsîtiyê de dixebite, geh xwe birîn dike, geh di bin baran dikeve, lê divê ew xwe hînî vê jiyana nû bike !!.

Bextê Rustem ê reş û qidoşê wî yê mirî jiyana wî li welatê xerîbiyê jî reş dike, dilê wê yê mişt bi eşq û evîna mirov û mirovatiyê kul dike û derd û bela jê re peyda dibin. Geh ewê nexweş bikeve, yan wê bête girtin û zindankirin, ji karê xwe bimîne, paşê karê wî ji dest dice. Vêca bi rojan li kolanan digere ta ku karekî din ji xwe re bibîne. Di bêkariya xwe de, ew dibe mêvanekî rojane ya çayxana Mistoyê Xilxolî ya ku heroj dost û hevalên wî têde çayê vedixwarin û sikembîlan dilîztin, ew jî tevlî wî kerwanê bê karan dibe.

Pismamekî wî û zavayê wî jê re karekî li karxana şerabê dibînin, bi kêf û şanazî karê xwe yê nû dike, zû fêr dibe û berpirsên karxanê jê hez dikin. Rewşa wî baş dibe dilê wî bi jiyanê xweş dibe, ji keçeka hevala xwe ya karxanê a bi navê (Ayten) ji dil û can hez dike, herweha keç jî pir jê hez dike, soz û peymana zewacê bi hev re didin, lê feleka reş rê li ber evîna wan digre û nahêle ew evîn here serî ji ber ku ji nişka ve Rustem li kolanê tê girtin û 4-5 mehan di girtîxanê de dimîne. Piştî ku ew ji girtîxanê direve, **D.R. (9)**

www.asivekurd.org

, li dergistiya xwe ya bedew digere nagere, wê nabîne..!! Kul û hesreta Aytenê di dilê wî de birîneke kûr vedike!!.

Piştî reva wî ji girtîxanê, ji tirsa polîsan, ji STENBOLê jî direve, diçe bajarekî dûr ku nasekî wî lê rûdinişt, demekê li cem wî dimîne û dîsa vedigere STENBOL a wêran ji xwe re li karekî digere. Bi giranî û dilêşî, bi zikekî têr û didiwê birçî, şev û rojên xwe derbas dike, dike nake, tu karî nabîne. Dost û dilxwazên wî jê dixwazin ku ew vegere welêt nava xelk û merivên xwe, lê ew naxwaze vegere û her li karekî digere.

Piştî demekê, li cem Kurdekî weke şagirt dixebite, li kolanê siciqan di nava nên de dipêçe û difroşe, rojê 0.5 benqenotê distîne, pê debara xwe ya rojane dike. Lê mixabin, wê jî pir dirêj nekir, ji ber ku dostê wî dadigere welêt û careke din bêkarî, betalî, kul û derdên giran li Rustem dest didin!!. Di gera xwe ya li karekî de, ew di glopeke şevê de, li cem camêrekî karê firotina çixare û çerezan dike, rojê 5 benqenotan werdigre, zû rewşa wî baş dibe, diravan ji dê û birayên xwe yên li gund re dişîne, li cihekî xweş û paqij, di hudirê glopê de radikeve, xwe dişo û vedişo, cil û kincên xweşik li bejin û bala xwe dike, pere û diravên xwe li ser hev datîne vedişêre. Di riya jineke pîs a bi navê Husniye Xanimê re dikeve dav û benda malbateke şêlanker î bê rewişt û bê namûs..!!Bi hinceta ku keça xwe bidinê, ew bê bext wî talan dikin, pereyên wî bi tevayî jê dibin û berîka wî vala dikin, di wê navê re, karê wî jî ji dest diçe, perîşan û belengaz dibe, heroj cilekî xwe difiroşe pê zikê xwe têr dike û roja xwe derbas dike. Careke din, heval, dost û hogirên wî jê tika dikin ku vegere welêt, karê gundîtiyê bike, li dê û birayên xwe miqayît û bi wan re alîkar be, lê ew bi ya wan nake, berê xwe dide wê yekê ku leşkeriya welatê xwe Tirkiyê bike.

Di leşkeriya behriyê de, li aşxanê, ji 20 garsonan re dibe şêf, gelek bexşîş ji serbazan werdigre, diravan ji dê û birayên xwe re dişîne û rojên leşkeriya xwe bi xweşî derbas dike. Lê, tiştê dilê wî dêşîne ew e ku, name ji hemû hevalên wî re tên, tenê ew di nav wan de bê name dimîne, wê yekê pir ew melûl û xemgîn dike..!!.Rebenê xwedê, ne dê, ne jî birayên wî xwendin û nivîsandina tirkî zanîbûn, da ku jê re naman bişînin.

Rojekê, hevalekî wî nav û adreseya rojnameyeke Qibrisî jê re anî û jê re got, navnîşana xwe di vê rojnamê de belav bike biweşîne û bixwaze ku keçên Tirk ên Qibrisê ji te re naman bişînin, tê ji xwe re bi wan mijûl bibî. Wî jî wilo kir, vêca gelek qîzên Tirk ên Qibrisê jê re name şandin, yek ji wan jî bi navê Reyhan bû, Rustem û Reyhanê li ser pelan hevdu nas kirin, ji hev hez kirin û soza zewacê ji hev re dan. Piştî kutakirina leşkeriyê, Rustem rê digre diçe Qibrisê, dergistiya xwe dibîne û ji hev re dibine jin û mêr. Li wê derê karekî xwe dibîne û dixebite. Di wê demê de, şerê navxweyî di navbera Tirk û Romên giravê de derdikeve holê û rewşa wî pir xirab û aloz dibe.

Nivîskarê romanê, jiyan xelkên giravê ya wê demê bi zelalî dide xuyakirin, çawa ku belengazên Tirk û Rom bi biryara kedxwer û nemerdên herdu gelan hevdu dikujin û ew berpirsên bêbext û xwînxwer mal û mewdanên herdu gelan didizin û ji xwe re diravan di bangan de kom dikin. Di vî warî de Rustemê mirovhez û hesteyar li dijî kuştina mirovan derdikeve û weha diqîre û dibêje:

"Keko ez mirov im, di xurist û pirtûka min de mirovkuştin tune. Ez naxwazim bibim têkoşer mirovan bikujim, berî her tiştî, ez bi xwe jî mirov im, xudan komek zar û zêçan im. Ew kesên ku di herdu aliyan de têne kuştin, hemû mîna min û te ne. Jiyan xweş e, mirin û kuştin çi re?!!.Çi re mirov here xwe bide kuştin an jî kesekî dî bikuje?!!..Divê her mirov li heya dawiya jîna xwe bijî, neyê kuştin û kesî nekuje, şer û kuştin şerma mirovatiyê ne!!.."

Ji ber helwesta wî ya mirovane, navbera Rustem û rêxistina tirkên Qibrisê xirab dibe, berpirsên rêxistinê wî dixine bin givaşê û jê dixwazin ku zûtirîn dem ew ji giravê derkeve û vegere welatê xwe Tirkiyê. Ew bê çare dimîne, bi destê jina xwe Reyhanê û herdu keçikên xwe yên piçûk digre, pişta xwe dide felekê û berê xwe dide oxirê, di demeke nêzîk de, careke din, li Stenbolê cîwar dibe.

09.04.2011Z-2623K

www.orsivekurd.org

Rêzgirtina Mafên Mirovan

Enehîte Murad

Sala 2011an ,dever dewleta Tonisê ye , ew ciwanê ku bêçar dibû encama merc û hoyên zor dijiwar jiyan li pêş çavên wî reş û tarî dibû ! wisan jî li kastîna bajêr, li pêş çavên xelkê Tonisê agir berdida bedena xwe ! û jiyana wî ji dest diçû . vêca jî , ew dikete rêzên pakirewanan û dibû simbola şoreşa yesemîn li Tonisê. Piştî vê bûyerê xelkê Tonêsê bêdeng nediman ! piraniyên wan li dijî rijîma Tonisê xwepêşandan û raperîn lidardixistin û dirûşmên azadî û rêzgirtina mafên mirovan hildidan û hino –hino rijîma Tonisê li pêş vîn û dilêriya gel bêçar dibû nemaze, serok komarê dewletê Zeyn El-abdîn. Lewre jî, dev ji serokityê berdida û bazdida ! vê yekê dikir ku , weke rûdaweke hevdem li pir dever û dewletên Ereb yên mîna : Misir , Yemen, Lîbiye , Ceza,êr ,Behrên, Sûriyê û H.W.D bi serkêşiya ciwanan hewş vede û heyameke nû di Rojhilata Navîn de serî hilde !? Weke pêşiyên me gotine : Tu dar serî gihane esmanan nîne ? Belê, ta kengê ev rijîmên şoven û dîktetor yên mîna hurç û hovan li ser sîngê miletên xwe pal vedin û bê şerm û fedî xêr û bêrên welêt daqurtînin , û hemwelatiyan weke kole ,perîşan , birçî bikin?. Piraniyên gelê Sûriyê bi hemû netewên xwe ve, hêviyên xwe bi serokê ciwan geş û bilind dikirin, ku ev serok Beşar wê karibe heyamê Sûriyê weke dewleteke şaristanî ,pêvajok û dadmend vejîne, ta ku rêzgirtina mafên mirovan têde cî bigire. Wisan jî wê bibe simbola azadî,aştî û wekihevî di Rojhilata Navîn de. Lê mixabin, roj ji rojê rewşa Sûriyê kambax û wêran dibû gelê Sûriyê di nava heyameke biv , tris û birçîbûnê de, li ber xwe dida . Lê, hema li vê dawiyê xelkê Sûriyê jî piştî bûyera Derayê ku ew zarokên biçûk , ku temenê wan dora heştsalî, peyên rjîmê ew didane ber darê îşkencê encama wê yekê xelkê bajarê Derayê bêdeng nediman, dîwar û sînorên tirsê hildiweşandin û di riya xwepêşandanan re daxwez û hêviyên xwe weke dirûşme bi rengekî aştiyane aşkere diyar dikirin û digotin : Bijî Azadî bimre koletî û di gel wê yekîtiya gelê Sûriyê nîşan didan . Wisan, jî rijîma Sûriyê har û dîn dibû , bajarê Derayê tarûmar dikir, bi tang, top ,debabe qurşînên xwe li hemwelatiyên destvala dibaran. Encama wê bi sedan xelkê Derayê dihatine kuştin ,birîndar û girtin. Lewre jî, li pir dever û bajarên Sûriyê mîna Şam û derdora wê ,Benyas, Tertos, Laztqiyê ,Hemê ,Reqê û H.W.D, tev li djî rijîma Sûriyê disekinîn raperîn û xwepêşandan lidardixstin. Zor mixabin, ku îro Sûriya me bûye kastîna şer û cengê û rêzgirtina mafên mirovan binpê dibe. Heyf û mixabin, ku ciwanên gelê Sûriyê bi hemû netewên xwe ve, bi destê rjîma bêbext li kastîn û çateriyan, di xwîna xwe de vedigevizin .

www.arsivakurd.org

Dumahîk: Li Sûriyê….

kar û barê komele û partiyan , qedexekirin û bi her hawî rêgirtina li ber karê rojnamevanî û ragihandinê , bi serde jî girtin û zorkirin li çi kesê ku nerazîbûna xwe ji vê rewşê heyî re bide xuyakirin , hêştiye û dihêle ku gelek, tişt li Sûriyê bervaja bêne fêmkirin , veşartin , têkilhev û bincil bibin .

Ji navîna meha Avdara borî û bi vir de , doz û daxwaza azadiyê di nav civaka Sûrî de gol vedide , liv û tevgereke xwepêşandanên aştiyane li hinde parêzgeh , bajar û bajarokan destpê kiriye , nemaze li başûrê Sûriyê , nêzî sînorê Urdinê , parêzgeha Der'ayê . Lê mixwabin , karbidestên rijîmê , ne tenê bi tund û tûjî , lê belê , bi kuştin û xwînherikandinê , xwestin wan xwepêşandanan ji ber hev bixin û bela wela bikin . Lê zû bi zû bi ser neketin û xwepêşandan berfirehtir bûn û her çû xwîn herikî , Tank û Panzêrên artêşa dewletê jî derbasî holê bûn , hejmara kuştî , birîndar û girtiyan her çû pirtir bû , û digel şêweyên ragihandina germkirin û gurkirina rewşê , û piropaganda bêserî û bêbinî , diruşmên xwepêşandaran ji doza azadiyê derbazî doza roxandina desthilatdariyê bûn.

Gelek malbat û hemwelatiyên Der'ayê koçber bûne , sînorê navnetewî ya Sûrî – Urdinî derbas kirine û îro roj li hêla Urdinê bi cî dibin , weke çawa dora 240 kes ji hemwelatiyên Sûrî yên Turkmen ji parêzgeha Latakiyê koçber bûne û derbasî Turkiyê , li wîlayeta Hatay – Îskenderonê bi cî bûne . Lewre jî , gelek nêrîn û helwest , semîner , daxuyan û manşêt di derbarey rewşa Sûriyê de, di medya yê de cî digrin … Çavdêr , siyasetmedar û rojnamevan bûyeran dişopînin , gelo ka berê Sûriyê li kû ye ? , û wê çi biqewime ? .

Hêz û dewletên Rojhilata Navîn , bi taybetî Turkiyê , Îran , Îsra'îl , Hemas û Hizbula , bi çavên vekirî û guhên bel , li rewşê mêze dikin , diponijin û ne dûre tevdîran distînin .

Yekîtiya Ewropî , rêvebiriya Obama , Bankî Mon û encûmena navnetewî ya mafên mirovan li Cinêvê , hemî bi dengên aşkere û zelal doz dikin ku hikumeta Sûriyê , van kiryarên xwe yên nemirovane bide rawestan , bê erê û na , bê dudilî , xwînrijandinê li dij hemwelatiyên xwe rawestîne , guh bide daxwazên gelê xwe û di zûtirîn dem de , xal û bendên lixweveger û rêformê cî bi cî bike .

Gelê Kurd li Sûriyê digel partiyên tevgera xwe ya siyasî ya niştimanî , ne di guhê gê de ye , duh jî , îro û sibe jî , û ji berî van hemî xwepêşandanên ku li hin deverên Sûriyê rû didin , her û her piştgir bû û her dê piştgir be , bona hemî doz û çalakiyên demokratîk û aştiyane li seranserî Sûriyê . Ji ber ku bawerî li cî ye ku , Kurd bi tevgera xwe ya siyasî , par û birek ji tevgera Sûrî ya niştimanperwer , demokratîk û aştiyane ye , û jê cuda nabe . Lewre jî, divê di biryaran de hevpar be , û çendî Sûriyê bi xêr be , Kurd dê bi xêr bin . Ango, çendî gavên demokrasiyê cî bi cî bibin , ewqas hemî dê li karê bin .

Parastina pêvajo û berjewendiyên gelê Kurd û çareserkirina pirsa wî ya netewî di siha heyameke demokratîk û aştiyane de ciyê xwe digre , û em bivên nevên , çendî dijayetî , kîn û kudret , kuştin û xwînrijandin li dar be , ewqas nexweşiyên şerxwazî , nijadperestî û paşverûtiyê serî hildidin û civak li şûn dimîne . Dem ne dema şoreş û bersivdana bi tivingan û xwînherikandinê ye , dema me ew e ku , çareserkirina hemî pirs û pirsgirêkan divê bi rêbazên aştiyane , bi diyalog û hişmendî be .

Em di wê baweriyê de ne ku pêşeroja Sûriyê ne ji siyaset û rijîma tek patiyê re ye .

4.05.2011

Mihyedîn Şêx Allî
Sekretêrê Parta Yekîtî ya
Demokrat a Kurd li Sûriyê .

www.arsivakurd.org

Gejna Rojnemevaniya Kurdî pîroz be

Reşoyê Pîrê

Rojnamegerî nêrîn û ramanên mirov û gelan diyar dike, Rola wê ne tenê ji bo parastina dîrok, çand, ziman û her tiştê bi gel ve girêdayî girîng e, lê belê ew bûyer û rûdawên di pêvajoya dîroka mirov û gelan de bûne jî diparêze. Ew ji bo parastin û dewlemendkirina zimên xwedî roleke berz û berçav e.

Gelê Kurd, di Rojhilata Navîn de, ji bo maf û azadiya xwe bi dehan raperîn rakirine.Lê mixabin dewleteke serbixwe ava nekiriye û zimanê wî nebûye zimanê dewletê. Lewre jî, rewşa rojnemegeriya Kurdî , ji yê hemî miletan dijwartite.

Gava mirov çêra rojnemegeriya Kurdî dike, rasterast malbata mîrê mîran – Bedixaniyan- û bi taybetî Miqdad Medhet Bedirxan tê ber çavan. Ji ber ku, di dîroka Kurdan de, xwedî banga netewî ya siyemîne – piştî Ehmedê Xanî û Hacî Qadirê Koyî .

Piştî dewleta Osmanî, malbata Mîrê Botan Surgindikin, li Stembolê bi cîwar dibe û ji wan re dibêje " ***Ez ditirsim ku hûn di nav Tirkan de, zimanê xwe ji bîr bikin û ger we zimanêxwe ji bîr kir , Hûnê welatê Botan û Kurdistanê jî ji bîr bikin. Tiştê ku min ji we divê, hûn di malên xwe de, bi zarok û Zêçên xwe re, bi zimanê bav û kalav biaxifin, yê we neke, ne kurê mine".*** Di rewşa neçariyê de,şahsîwarê peyvê, Mîrê gewre, M. Bedirxan li Misrirêdest davê pênûsa xwe û kar û xebata rojnemavanyê dike û di 22ê Nîsana 1898 an de, yekem rojname, di bin navê "***Kurdistan***" de diweşîne. Li gorî berpirsiyarê rojnamê ku, her 15 rojan hejmarek wê bête weşandin.

Li ber zordariya dewleta Osmanî cihê çapkirina wê pir caran hatiye guhartin. Lewrejî, ew rojname bi navê rojnameya gerok hatiye nasîn.

Ji 22ê Nîsana 1898 an ve, ta 1902 an, 31 hejmar tenê hatine weşandin. H. 1-5 Qahêre. H.6-19, Cinêv. 20-23 Qahêre ,24 Lubnan, 25-29, Folkstan û30-31 li Cinêv.

Hezar rehme li gora M. Bedirxan be û cejina hemî rojnemevanan pîroz be.

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de

www.arsivekurdi.org